Wergereke Goranî ya *Ẕat el-Şîfaya* Îbn el-Cezerî

Mustafa Dehqan*
Wergera ji Ingilîzî: Mîrza Baran

Armanca min di vê nivîsarê de ew e kurtedanasînekê li ser destnivîseke bi zimanê goranî ya kitêba Îbn el-Cezerî ya bi navê *Ẕat el-Şîfa* pêşkêş bikim. Ev kitêba hanê dikeve nav cûrê *sîret*ê, anku ew berhemên ku jiyana pêxemberê musulmanan neql dikin. Destnivîsa bi zimanê goranî nû peyda bûye û hêj nehatiye çapkirin; û mîna berhemên din ên sîretê li ser nasandina pêxember, rewşa wî ya payebilind, jiyan û gotinên wî ye. Girîngiyaa vê destnivîsê di van yekan de ye ku: (a) ew cihekî ji bo nasîna destpêkî ya metnên goranî yên bingehî yên li dor pêxemberî digire; (b) ew nîşan dide ku hin standardên metnên *sîret*ê yên goranî ji edebiyata îslamî ya pêştir hatine wergirtin; û (c) ew herweha hin nêrînên rêzimanî yên li ser zimanê goranî jî di nav xwe de dihewîne. Piştî danenasîna Îbn el-Cezerî û berhema wî *Ẕat el-Şîfa*yê, ez ê taybetmendiyên sereke yên metna goranî bidim. Di Servehî I û II de venivîsîna hindek rêzan û û berpereke nimûneyî ji destnivîsarê hatine danîn.

Şems el-Dîn Muḥammed b. el-Cezerî

Li gel hin tevliheviyên di nav berhemên destê duyê de,[1] em bi jiyan û xebata Şems el-Dîn Muḥammed b. el-Cezerî, ku bêtir wek Îbn el-Cezerî tê naskirin, baş agahdar in. Serê ewil, divê agahî bi rêya nîşeyên otobiyografîk ên el-Cezerî bi xwe, ku di nav du xebatên wî *Cami‘ el-Esanîd* û *Ẋayet el-Nihaye* de cih digirin, bên bidesxistin. Bi ser de, hejmareke çavkaniyên destê yekê ên din jî li ser jiyan û xebatên îbn el-Cezerî hene. Ew 25ê remezana 751an/26ê mijdara 1350an li Şamê hatiye dinyayê. Piştî ku wî xwendina xwe ya seretayî li Şamê qedand, sala 768/1376an ji bo hecê çû Mekkeyê. Dû re wî bar kir çû Qahîreyê da ku li ser hedîs û qiraatê bixwîne, lê zû vegeriya Şamê ku li wê derê dem û bala xwe da fiqih û hedîsê û li ber destê el-Dimyatî, el-Asnawî û el-Abarqûhî xwend.

* Lêkolerê serbixwe, Kerec, Îran,
e-mail: mustafadehqan@yahoo.com

Derwaze Gulan 2017 ISSN 564-7075
Jimare 1, rr. 134-139 www.derwaze.net

Di navbera salên 774/1373 û 785/1383an de, wî îcazeya muftîtiyê ji Îsmaîl b. el-Kathîr, Şêx Diya' el-Dîn el-Qezwînî û Ebû Hafs 'Umer b. Rislan el-Bulqînî wergirt. Sala 793/1391an, Sultan Barqûq yê memlûk ew kire qaziyê Şamê. Çend salan paştir, gava mal û milkên wî hatin misaderekirin, ew çû Bursayê û dû re bû alîmekî osmanî. Şerê navbera Bayezîdê 1ê û Têymûrê Leng (805/1402) bû sebeb ku dîsa warê xwe biguhere. Piştî ku Teymûr zora Bayezîd bir, el-Cezerî birin Kütahyayê û pêşkêşî Teymûr kirin. Wî jî el-Cezerî şand Semerqendê ku li wê derê çend salan wek mamosteyekî pêşeng xebitî. Wextê ku Teymûr meha şe'banê ya 807an/sibata 1405an mir, Îbn el-Cezerî berê xwe da Herat, Yezd, Îsfehan, Xorasan û Şîrazê. Pîr Muhammed, desthilatdarê Şîrazê, ew kir qaziyê bajêr. Îbn el-Cezerî hingê çû Besrayê û dû re, sala 823/1420an, Mekke û Medîne ziyaret kirin. Piştî vegera xwe ya ber bi Şîrazê ve, wî keda xwe da xwendina fiqih, *Qur'an* û hedîsê. Ew di 5ê rabi' I ya 833yan/2yê berfanbara 1429an de mir.[2]

Ẕat el-Şîfa

Îbn el-Cezerî yek ji navdartirîn nivîskarên îslamî yên sedsala 15an e ku hejmareke mezin a xebatan li pey xwe hiştine. Mijara taybet a vê kurtenivîsarê ev xebata wî ye bi navê *Ẕat el-Şîfa fî Sîret el-Mustefa we el-Xulefa el-Xemse* (Esasê Şîfayê di Jiyana Mustefa [Pêxember] û Pênc Xelîfeyan de), ku *urcûze*yeke[3] menzûm e û bi qafiyeya *recez* di 515 risteyan de hatiye hûnan. Nivîskar xebata xwe diyarî Pîr Muḥammedê desthilatdarê Teymûrî kiriye. Jiyana pêxember û ya xelîfeyên wî ji Ebû-Bekir ta Hesen b. 'Elî di beşê pêşîn ê kitêbê de ye. Çend rêz li ser xelîfe 'Umer b. 'Ebdulezîz jî hene. Di beşê duyem ê kitêbê de tenê 23 şi'r hene ku li siltanên misilmanan ên wek Nur el-Dîn Zengî û Selaheddîn Eyyûbî hatine diyarîkirin. Tarîxa nivîsîna *Ẕat el-Şîfa* ya el-Cezerî hêj jî bi deqîqî nayê zanîn, lê bi ihtimaleke mezin di navbera salên 808/1405 û 812/1409an[4] de hatiye danîn.

Balkêş e ku *Ẕat el-Şîfa* li nav derdorên rewşenbîrên kurd berbelav bûye. Hejmara nivîskar û nivîsevanên kurd yên ku destnivîsarên nû ji wê durist kirine nîşaneya berbelaviya wê ye.[5] Muḥammed b. Hecc Hesen el-Alanî el-Kurdî (mir. 1189/1775–76)[6] şerheke gelek balkêş li ser *Ẕat el-Şîfa*yê nivîsiye. Ev şerha *meczî*[7] carinan bi navê Muḥammed b. Hesen Şehrezûrî[8] re tê hilanîn.

Wergera goranî ya *Ẕat el-Şîfa*yê

Hindî ku ez dizanim, bi tenê yek destnivîsara wergera goranî ya *Ẕat el-Şîfa*yê hatiye parastin, ku ew jî di nav koleksiyoneke destnivîsaran ya piştguhkirî de ye li Kirmanê, li başûrê Îranê. Xweşbextane, van heyamên dawî, hin destnivîsarên girîng ên vê koleksîyona Şeyxîyye ya Kirmanê[9] hatine veguhastin bo kitêbxaneya

Navenda Ansîklopediya Îslamî ya Mezin a li Tehranê.

Dhāt al-Shifā-yi Kurdī ("Ẕat el-Şîfaya Kurdî") destnivîsareke anonîm e (Jimara qeydê 1102, 16 per, 18 × 11/5). Di kitêbxaneya Navenda Ansîklopediya Îslamî ya Mezin de tenê tê gotin ku ew ji koleksîyona Şeyxîyye ya Kirmanê hatiye wergirtin. Lê belê, tarîxa nivîsîn û jêdera wê ya deqîq ne zelal e. Nayê zanîn jî ka kê ew li ku derê wergerandiye. Di her berperekê de 18-25 rêz hene. Kaxeza wê cureyekî kaxeza qehweyî ya *ferengî* anku ewrûpî ye. Nivîs li hin cihan nayê xwendin û bi şêwazê *neste'lîq-i teḥrîrî* hatiye nivîsin. Li ser her berperekî *Ẕat el-Şîfa*ya kurdî hin haşiye hene. Du mohrên kitêbxaneyan li ser berperê wê yê dawiyê hene.

Beşê ewil ê destxeta *Ẕat el-Şîfa*yê ji 743 ristên beytên biqafiye an jî *mesnewî* pêk tê (berperên 1a- 12b), û beşê duyem bi helbestên kurdî ve têkildar e ku tê de 192 şi'r hene (berperên 13a-16b). Weku xuya ye, sernavê destnivîsara goranî ya menzûm wiha ye: *Dhāt al-Shifā-yi Kurdī mawsūm bi Ṣāḥib al-Shifā'a* ("Ḏat el-Şîfaya Kurdî, ku wek Ṣaḥib el-Şîfa'e tê nasîn", berper 1a). Mixabin nasnameya wergêrê rastî yê goraniya *Ẕat el-Şîfa*yê nayê zanîn. Diyar e ku nivîskar li Kurdistanê gelek navdar bûye: parên navê nivîskarê *Ẕat el-Şîfa*yê bi şaşî daxilî desxetê bûne.[10]

Ji bo ku bi awayekî zelal mirov xwezaya wê têbigihe, berî her tiştî divê wê wek *werger* bizanin. Nivîskarê goranî ê nediyar têra xwe ji gewdeyê giştî yê *Ẕat el-Şîfa*yê[11] haydar bû. Lê belê, wî di wê *wergerê* de xwe ji senifandineke rasterast ya hewldana wergerî ya rêz bi rêz û peyv bi peyv dûr xistiye. Bi ya min, sedemek ji bo vê rêbazê ew e ku nivîskar li ser zimanê erebî bi têra xwe ne şareza bû. Ihtimalen her ji ber vê yekê bûye ku wî çendîn ristên nû li kitêbê zêde kirine, ku bi vî rengî hêvî kiriye ew derên bi erebî nedihatin xwendin telafî bike. Gelek ji wan ristên wî carinan wergereke herfî, carinan jî wergereke serbest an jî adaptasyona metna erebî ye. Lê belê, şêwazê serbixwe û wêrek yê ristên goranî heta dereceyekê nelihev e li gel sergiranî û ciddiyeta zimanî ya Îbn el-Cezerî û bûye sebebê hin cudahiyan di versiyona goranî de. Iqtibasa wergêrê nediyar ê goranî ji versiyoneke erebî ya sadekirî ya *Ẕat el-Şîfa*yê ye û wisa diyar e ku ji bo wergêrî xem û armanca sereke xwînerê kurd bûye. Lewma diyar e ku wergera wî bikêmas e.

Nivîskar carinan qismeke pexşan ji gewdeyê sereke yê *Ẕat el-Şîfa*yê bi farsî dide. Naveroka berhemê ji diyarkirina rojbûna pêxember, li ser esasê baweriya ku danzdehê meha rabî' Iê peyda bûye, dest pê dike heta digihe qiseta şecereya pêxember. Berhem du kategoriyên şecereyê ji hev cuda dike: Yekem dê, bav, bapîr û merivên din ên pêxember; duyem, pêxemberên kitêbî yên pêştir ku jê re wek paşxaneyê ne. Jiyana dîrokî ya pêxember û mijarên gewdeyê sereke yê *Ẕat el-Şîfa*yê herwiha di wergera goranî de jî têne dîtin. Lê belê, ev werger li

gelek cihan, li metna erebî hatiye şibandin û ne li ser bingehê metneke tekmîl û pêbawer a *Ẕat el-Şîfa*yê ye.

Paşnot

1 Bnr., bo nimûne, Paketçî 1996; Altıkulaç 1999.

2 Ji bo agahiyên berfireh bnr. Taşkubrazade 2010, 40–43; û bi taybetî Binbaş 2014, 156–64.

3 "Urcûze" cureyeke menzûm e ku bi kêşa recezê hatiye nivîsîn, dîdaktîk e û lewma girîngî ji aliyên helbestî zêdetir li ser veguhastina merem û naverokê ye.

4 Bnr. Anonymous 1981; Binbaş 2014, 166, 170–72.

5 Bnr., bo nimûne, destxet jimare 1491, Merkez-i Iḥya-yi Mîras-i Islamî, Qum, tarîx 1234 h., bi nivîsîna Ḥamid Mardûxî.

6 Bnr. el-Alanî el-Kurdî 1987.

7 Şêweyekî taybet ê şîrovekirinê ye, ku tê de şîrovekar pêşiyê hin xalên serekî nîqaş dike û paşê ji xwendevanan re wan bi berfirehî şîrove dike.

8 Bnr., bo nimûne, destxet jimare 5710, Mer'eshî Library, Ref' el-Xafa 'en Ḏat el-Şifa, tarîx 7 Ḏu el-Ḥijje 1339 h.

9 Ew wek koleksîyona şexsî ya Zeyn el-'Abidîn Ibrahîmî jî tê zanîn.

10 Bide ber berper 1r:

نه قول امام جزری مکان ▪ کنیه ابوالخیر شمس الدین بیان
علی بن یوسف اصل جزری ▪ کلامی شفان بزانه قدری

[ne qewl-i imam Cezerî mekan • kunye Ebu el-Xeyr Şems el-Dîn beyan

'Elî b. Yusuf esl-i cezerî • keḷamê şefan bizane qedrî]

11 Bo nimûne, bide ber berper 1b:

باوره و نظم او ذات الشفا ▪ اوصاف رسول هر پنج خلفا

[bawere we nezm ew Zat el-Şefa • ewsaf-i Resûl her penc Xulefa]

Bîbliyografî

el-Alanî el-Kurdî, Muḥammed b. el-Hajj Hasan. Kitab Ref' el-Khefa Şerḥ Ḏat el-Şifa, ed. H. 'A. el-Selefî & S. M. S. el-Zîbarî (Beyrût: 'Alem el-Kutub, Mektebet el-Nehde el-'Erebîyye, 1987).

Altıkulaç, T. "İbnü'l-Cezerî", tê de: Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi 20 (1999): rr. 551–57.

Anonymous. "Kitab Ḏat el-Shifa fî Sîret el-Nebî thumme el-Xulefa'", tê de: el-Mewrid 37 (1981): rr. 260–61.

Binbaş, İ. E. "A Damascene Eyewitness to the Battle of Nicopolis: Shams al-Dīn Ibn al-Jazarī (d.833/1429)", tê de: Contact and Conflict in Frankish Greece and the Aegean, 1204-1453: Crusade, Religion and Trade between Latins, Greeks and Turks, Nikolaos G. Chrissis & Mike Carr (ed.) (London & Burlington, VT: Ashgate, 2014), rr. 153–175.

Paketçî, A. "Ibn Cezerî, Şems el-Dîn Ebû el-Xeyr Muḥammed b. Muḥammed b. Yûsuf", tê de: Da'iretulme'arif-i Buzurg-i Islamî 3 (1996): rr. 231–34.

Taşkubrazade, 'Isam el-Dîn Eḥmed. el-Şeqa'iq el-Nu'manîyye fî 'Ulema' el-Dewlet el-'Uthmanîyye, ed. S. M. Tebatebâ'î Bihbehanî (Tehran: Kitabxane, Mûze we Merkez-i Esnad-i Mejlis-i Şewra-yi Islamî, 2010).

Servehî I. Herfguhêziya hindek rêzan ji destnivîsara *Zat el-Şîfa*ya bi goranî

Berper	**Rêza ewil û duyê ya her berperekê**
1r	ya Ṛebb-i hadî ya Ṛebb-i hadî • ya mewcid ne xak ateş u badî ya rafi‘ be ‘erş-i e‘la mebadî • ya muzil, mu‘iz zelal u hadî
1v	beḷkem be sayey dîn-i esfîya • ya xûbe rehmet şeyx ew nebîya pertuwî ne fezl-i Resûl-i emîn • be sayey şeyx şay Sirac el-Dîn
2r	beyan-i neseb ne Zat el-Şefa • ta ‘Ednan kirya bî xilaf u jîya ne ‘Ednan mişten ta be Isma‘îl • Isma‘îl b. Ibrahîm Xelîl
2v	wazih u ṛûşin herî Amine • zanaş şerîfî Resûl yeqîne weqt-i wiḷadet meşhûre zenan • ce qiyb bîn peyda zenan hem bizan
3r	ṛawîyan watan qewlîyan ṛaste • weqt-i wiḷadet Resûl bî reste şuybey* kenîz-i Ebû Leheb bî • mujdey mizgan fexr-i ‘Ereb bî
3v	watin Helîme çîn bî eweḷ car • eldiqet* sust bî îse xoş reftar ewbad*-i beyan zîyad ferawan • keḷam muxteser mekere tawan
4r	şukr-i Xuda wat el-hemdu lillah • sicdey şukr birya mel‘ûn-i gumrah mexzûl u meqtûl be xarî zarî • kijyan u biryan meker inkarî
6v	dubare çadir awrid we ser da • watiş er piydan wahe huwiyda we’l-hasil si car kirdiş imtihan • her wext birehne piyk bî* pinhan
8r	ne seray-i qewl cem‘-i me‘qûlîn • perakende bîn çenî ewle‘în Cibri’îl ama bu sûz-i iqrar • insane hicretiş hem kirya izhar
9v	weqtî ki hezret hicret bî zahir • Qureyşî yik ser wek pûş-i bahir ateş be can bîn îl u tewayif • Qureyş u E‘rab ne Heqq bîn xa’if
10v	ew seng-i pare bî be winey ahir • ne xewf-i yaney qewman be zahir parey seng mama* her yik ser-i bam • ce naw-i yane feryad-i eqwam

Servehî II. Berperê ewil (fol.1r) ji destnivîsara *Ẕat el-Şîfaya* bi goranî